QITÊBXANA HAWARÊ

HEJMAR

3

# DILÊ QURÊN MIN

Ji giyanê bavê min re -

Dr. QAMIRAN ALI BEDIR-XAN

Çapxana Tereki
ŞAM
1932

QITÊBXANA HAWARÊ

HEJMAR

3

# DILÊ QURÊN MIN

- Ji giyanê bavê min re -

INSTITUT KURDE de PARIS
- BIBLIOTHÈQUE -

DR. QAMIRAN ALI BEDIR-XAN

Çapxana Tereki
ŞAM
1932

# Dibistan

Bavê min! qo bû sibe
Ji nivînê radibim
Dest û ruyê xwe dişom
Ez dixwazim mêr bibim

Xurînîya xwe dixum
Sibe her tişt gulistan
Ez qitêbên xwe dibim
Diçim jibo dibistan

Dibistan pir xweşiq e
Bi hogir û hevalan
Bi qitêb û mamhoste
Bi çîroqa newalan

Em hemî hej wê diqin
Ji bo zanîn qanî ye
Têde qenîn lehîstoq
Dibistan xweş xanî ye.

# Heyv û Ster

Îşev şev e şev bi şev e
Dê digirî tirba xwe ve
Heyiv derqet stèra xwe ve
Dilqetî me û sîngjar im
Bè welat û bê bajar im

Erdê xwe re ez heyran im
Birîndar û bè derman im
Ji qurdan re ez kurban im
Dilqetî me û sîngjar im
Bè welat û bè bajar im

Bê xweyî me ez tenè me
Yeq ji camêrên dinè me
Ji bêbextî ez qetî me
Dilqetî me û sîngjar im
Bè welat û bè bajar im

Îşev şev e şev bi şev e
Bavê min tê gora xwe ve
Heyv derqet stêra xwe ve
Dilqetî me û sîgjar im
Bê welat û bê bajar im

# Şex Seîd

Şèx Seîdê bihuştîn
Zilameqî mezin bû
Di tarîya şevê de
Ji bo milet ew rabû

Milet nezan û exsîr
Ji xêra xwe bèxeber
Di xeweqe giran da
Bê kasid û bê rêber

Weqe steyra sibehê
Şèx Seîd hat ji Pîran
Bi bawerî û bi sund
Bi heval û bi mêran

Milet nezan û exsîr
Jê re ne bû arîqar
Şèx Seîd dar ve qirin
Şa bûn dijmin û neyar

Destê dijmin çend hezar
Qurmanc quşt û xenikand
Weq Extî diqtor Fiad
Mèr ne hiştin gî nekand

Şûrê Şèxê rehmetî
Xwîna wî de vemirî
Lê Qurdistan hè sax e
û Qurdistan ne mirî

# Derman

Havîna dilê min
Ava sar dixwaze
Buhar e û dinê
Bi govend û saz e.

Heyv û stêr bi ruhnî
Mekaman dibêjin
Sînga min tejî ye
Derdên min dirêj in

Dinê dibirike, lê
Enîya min tarî
Çem xweş diheriqe
Dil bê arîqarî

Ne girîn û ne kîr
Birîna min qûr e
Bêgef im dimeşim
Çikas ev rê dûr e:

Pora min gewr bûye
Dest û zendên min sar
Ne tenê dil û qezeb
Hestî ji birîndar

Destê dijminan de
Welatê min kurban.
Jiyîn çi bû ji min re
Êş, arihan û jan.

Dil, sîng şewitî ne
Şabûna me girîn
Xebat derman dide
Ji bo derd û birîn,

# Dilê çûqê

Çûqeqe qiçiq
Qeti bû davê
Cih dane jê re
Bi zad û avê.

Riqe bû ew cih
Riqeqe delal
Zadê wê şîrîn
Ava wê zelal

Zer bû ew riqe
Ji zêr bû ji zîv
Lê çûqê ne xwar
Xurînî û şiv.

Bes digot her rû
Bi dengeqî şewat
Ez gorî te me
Ax welat ! ! welat ! !



# Ya dê!!

Dayiqa min delal e
Xweyî ji min re ew e
Ser landiqa min de bû
Ne got sar e, ne şev e.

Te hej qurê xwe diqir
Ya dayiqa dilşewat
Di qavilê xurbetê
Bê nan û av, bê welat.

Ez sêwî bûm, tu tenê
Bêqesîya dinê da
Bi sîngeqe kor û jar
Ma ji min re qê şîr da.

Ya dê, ya dê megirî
Xwedê mezin, piyar e
Dayiqa min a delal
Perîşanî ne ar e.

Çikas zehmet min da te
Bi girîn û nexweşî
Mezin bibim dê bibe,
Jiyîn j'te re dilxweşî.


# Xweha min

Xwîşqa min hê qiçiq e
Niqare rêve biçe
Ez destê xwe didim wê
Bi min re pir xweş diçe

Her rû min re dibêje
Qeqê min ê dilovan
Çîroqeqê bibêje
Ji jiyîna nêçîrvan

Ji çîroqa gur û hirç
Serçavê wê geş dibe
Ez dilê wê xweş diqim
Dilê min ji xweş dibe

Ez ji wê pir hez diqim
Qi hej hwîşqa xwe naqe
Bi çavên xwe ên şêrîn
Xweha min çikas çaq e



# Qitêba min

Qitêba min spehî ye
Qitêbeqe pir mezin
Tê de her tişt dibînim
Qulîlq, qitiq, berx, bizin.

Ez geleq hej wê diqim
Rûpelên wê çeleng in
Çîroqên wè xweşiq in
û resmên wê bireng in.

Qitêba min dibèjit
Welat bav e, bra û dê
Her gav hiniq dixwînim
Çikas qêfa min pê tê.

Qitêba min dibêje
Sor, spî, qesq e: ala me
Ezê yeqê biqirim
Sibê ji bo mala me.

Qitêba min spehî ye
Qitêbeqe pir mezin
Tê de her tişt dibînim
Qulîlq, qitiq, berx, bizin.

# Delale !!

Germîya xwîna te ji çavên te xuya!
Delala min tu dar î ser berf û çiya

Li çavên te ên qesq mêrg û parîz hene,
Li dengê te è nerm, girînên zîz hene

Dilê min hêlîn e, zend û destên min text
Jiyîn û xweşî yî, tu î armanc û bext

Dîroqa spehîtî, bin lîngê te de mir
Nijde zêr û zîv te dil û can talan qir.

Ez bibim destê te de piyale û piyan
Tu bibe ji min re dotmîr û sermiyan.

Ser û sereq bibe em gî peyayên te
Tu ewr û ezman bibe em çiyayên te

Germîya xwîna te ji çavên te xuya
Weq Heyv î delalê !!! bi ser berf û çiya.

# Gornistan

Tenişta deşta Mûşê
Quştineqe xwîndar bû
Ne tenê mêr û mêrxas
Sermiyan jî birîndar bû.

Neyar hemî şewitand
Ne gund berda jî ne deşt
Hêstir girîn û hawar
Mehan çar û rojan heşt

Weqê dijmin nêzîq bû
Bê guman bû niqarî
Sêzde qeçên Qurdistan
Xwe avêtîn robarî

Li nav qefên ava sar
Heta îrû jibo wan
Sed girîn û sed qûvan
Sed mekam û sed stiran

# Derew

Dar û çiya — Ne ma giya
Şêr û piling — Bê zend û ling
Gur, mar û hirç — Zaro bê pirç
Ax... ji bo çî — Qî ma hirçî
Bêsebr, bêbext — Bê al, bê text
Ne dest ne çav — Reş e serçav
Qanî û av — Roj heyv û tav
Çire xwîn germ — Çima dil nerm
Ewr û ezman — Stran û ziman
Vemirî, mir — Xurt e darbir
Gelî, deşt, gir — Xwelî, agir
Gulan, Adar — Bê av û dar
Welat, hawar — Bûye êvar
Nan, dawet, dew — Şor, sund, derew.

# Denge dê

Qurmancî zmanè bav û qal e
Tirba xwe de dè bi wî dinal e

Qurmancî ye deng û şora pêşîn
Qurmancî ye deng û şora paşîn

Sor gewr û qesq bi rengè qurdî
B'qurmancî,tenè bi dengê qurdî

Bavê min û dadiqa sipîpor
Banî me_diqin ji tarîya gor

Qurmancî zmanè bav û qal e
Tirba xwe de dê bi wî dinal e



# Nûbuhar

Nû buhar e nû buhar e
Deşt û çiya mèrg û dar è
Qanî û çem xweş û sar e
Tum qenîn e tum geşî ye
Ẍem û hêstir çavreşî ye

Gul bi bûq in bi bûqiq in
Pal û newal çi xweşiq in
Berx û goliq hè qiçiq in
Tum qenîn e tum geşî ye
Ẍem û hêstir çavreşî ye

Bèdengî ye bi reng û zad
Heyv ruhnîya xwe daçiqand
Gul û bilbil hev ramisand
Tum qenîn é tum geşî ye
Ẍem û hêstir çavreşî ye

Ji zozan'e blûrvan e
Ji lawiqên dil û can e
Ev nû buhar .·. Qurdistan e
Tum qenîn e tum'geşî ye
Ẍem û hêstir çavreşî ye,

# Qeyfxwesî

Ez qurdeqî piçûq im
Welatê min mezin e
Tejî rêl û çiya ye
Tejî berx û bizin e

Bi zozan û mebehan
Welatê min çeleng e
Tev robar û tavgehan
Bi qulîlqan bireng e

Qanîyên wî taze ne
Çar rexên wan sorgul in
Xweyî qêf in dê û bav
Dengbêjên wan bilbil in

Ne girîn û nesaxî
Bes govend û dilxweşî
Têde herqes qamiran
Bi xebat û dilgeşî

# Yeqbûn

Ev Lor û Bextiyarî Baban:
Qurdmanc û Hevreman û Zazan ;

Qurdên ji welatê rom û Sorî ,
Qurdên Ecem û Irak û Sûrî ,

Qurdên ji welatê jor û jêrîn :
Sergav bilind û zexm û nêrîn ;

Qurdên ji Blûc û Qurdên Efgan,
D' hêvî de yeq in û yeq di raman

Yeqbext in hemû, ne bextiyar in,
Ser erd û dinê, birenc û jar in.

***

Zerdeşt bû mela ji bo me qurda
Kanon bû çiraya zendavesta

Ew felsefeya kedîm û pir nûr,
Zendî, zmanê qevn û meşhûr ;

Zerdeşt û çiraya zîvê Zerdeşt ;
Ruhnî ew e, ser çiyan û ser dest .

Her gat ji qitêba Zendavesta ,
Pêteq bû li dil, gurî di desta ,

***

Ristem ji me ye û şah Nadir ,
Siltan Selahedînê dengîr ,

Xanî û Melayê Bate, Teyran;
Gî qurd in hemû ji xwîna qurdan.

Nabî ji me ye, û Şêx Ehmed;
Hîmê me ye Zend û dewleta Med

Agrî, Sîne, Wan û Mûş û Zîlan,
Qanî ne, ji wan vejîne xortan

Sinî, Elewî û Eyzedî çî ? ? ?
Em bûne xulam û mane birçî ! ! !

Qurd in, ne cuda ji dar û ra ne,
Bin destê Xwedê û yeq xwedan e,


Qurd in hemû em, ji yeq nijad in
Tev dad û qerem û paq nihad in.

Bextên me yeq in, ne sê ne çar in,
Em Qurd in û tev bira û yar in.

***

Agrî, Sîne, Wan û Mûş û Zîlan,
Qanî ne ji wan vejîne xortan

Sinî, Elewî û Eyzedî çî ? ??
Em bûne xulam û mane birçî ! ! !



# Tevda

Trank, trank û trank!!
Ma çi ye?
Hèsinger dixebetin.
Xiş, xiş û xiş
Ma çi ye?
Ax, gîsin dilebitin.

Gir, gir û gir!!
Ma çi ye?
Rêhesin diçe û tê.
Tek, tek û tek!!
Ma çi ye?
Pale ne, çêdiqin rê.

Ting, ting û ting!!
Ma çi ye?
Pembû û qevanjen.
Xir, xir û xir
Ma çi ye?
Prot in, axê diqin den

Lê, lo lè, lo!!
Ma çi ye?
Gundî zevîyê de ne
Were.... here!!
Ma çi ye?
Gundî zadè xwe tîne

Dengeqî xweş!!
Ma çi ye?
Dengê zaro, dibistan
Dixebitin!
Ma qî ne?
Em in qurên Qurdistan

# Defter

Kelem, qiteb û defter
Meqteb ruhnî û rêber

Em hej zanînê diqin
Hon-jî kasê me biqin

Werin brano meqtebê
Xwe bavêjin edebê

Zanîn xweş e û çaq'e
Meqteb 'delal û paq e

Hogir heval û xebat
Zanîn merîtî, malbat

Sor, spî, qesq û dibistan
Avahîya Qurdistan.

# Sêwî

Ez sêwî me û tenê
Bê dê me ez û bê tav
Perîşan im û jar im
Şev hene bê nan û av

Zivistan e û berf tê
Kinê sar e her der sar
Ne agir e, nîne nan
Ji birçîtî bû me jar

Paşila dê min ne dît
Germiya dê çawa ye
Min bavê xwe jî ne dît
Dilê min ne ava ye

Bavê min mir şerî de
Dêya min di hicretê
Dinê sar e her der sar
Zivistan e û berf tê

Welatê min jî dûr e
Erd û axa qurdistan
Xwedê biqe ez bibim
Jê re gorî û kurban

INSTITUT KURDE de PA[RIS]

# Dilê min !

Min bajar navê
Rez, dehl û rêl
Qerîyên bizin
Qeç û şivan
Jinên rewş û reng
Qeçên eşîr
Pantor û çaqêt
Şal û şapiq
Sor spî, qesq û zer
Erdqî bi av
Golgevan û ga
Ne mîr ne axa
Çavên stêr zêrîn
Welat bû yeq
Dar çiya qenîn
Milet rabû
Min bajar navê
Rez, dehl û rêl

Bes lêva avê
û Kelîsêl
Nêrîyên mezin
û bilûrvan
Bê dil û bê deng
Bi can û şîr
Dilê min raqet
Qumqî qiçiq
Aşitî, bext, şer
Bi heyv û tav
Herqes bav û bra
Qurdistan za
Ne jor ne jêrîn
Qurd xwîşq û qeq
Ne ax ! ! ne enîn ! !
Welat şa bû
Bes lêva avê
û Kelîsêl.

# Du bira

Du sèwî ne; bavè wan,
Di şerî de miriye.
Dewlemend bûn, bûne jar;
Xwedè wisa qiriye.

Gulreng bû bûn dilê wan
Ji qenîn û dilxweşî.
Xwedè wisa qiriye;
Ne ma şahî, dilgeşî.

Her du ji xwe re dibèjin;
—Xem û qeser ma çi ne ?
Di vè dema tarî de;
Çend sed qurmanc birçî ne

Çend sed qurmanc birîndar!
Çend sed qurmanc bigirîn !
Deşt û zevî bi laşin ;
Sîngèn bûqan bi birîn.

Destèn wan de dilivin
Rojava û rojhelat
Dixebitin rûj û şev ;
Ji bo felata welat.

Du sêwî ne bavê wan ;
Di şerî de miriye,
Dewlemend bûn, bûne jar;
Xwedè wisa qiriye.

# Xebat


Qeqinon werin xebatê
Sibe bûye roj helat
Bi zanîn û meqtebê
Ava dibe ev welat

Werin, werin dibistan
Dergehê xwe veqirî
Werin her rûj zêdetir
Bi zanînê, biqêrî

Werin lawinon meqtebê
Mêqteb hêlîna me ye
Bibezin zû, lez werin
Zanîn hevîna me ye.

Roj qanîya ruhnî ye
Meqteb qanîya zanîn
Dê û bavên me hemî
Qeç û lawên xwe anîn

Werin, werin meqtebê
Hêlîna me dibistan
Bi xwendin û zanînê
Ava dibe Qurdistan.



# Ala Qurdan

Ronahiya dil û çav;
Diyarîya dê û bav;
Pêsîra wê roj û tav,
Spehîtîya ax û av.
Ala qurdan ser be ser
Sor û gewr e qesq û zer.

Kehremanê ceng û şer
Kiblegahê mê û nêr;
Cayegahê can û ser
Afitabı dar û ber
Ala qurdan ser be ser
Sor û gewr e qesq û zer.

Hêvîya xortan û mêr,
Mihreba mizgeft û der
ahê evd û şahê şêr
B'reng û bihn e zîv û zêr.
Ala qurdan ser be ser
Sor û gewr e qesq û zer.



# Welatê delal

Welatè min î delal
Çikas spehî çeleng î
Rêl û çiya singa te
Tu birewş î bireng î

Zozanên te honiq in
Çiyayèn te biberf in
Solînên te bi qulîlk
û teyrên te biref in

Her tiştên te spehî ne
Tu weq rewşa dêya yî
Bavè min î, brayê min
Tejî mèrg û giya yî

Di axa te bavè me
Radiqevin. dinivin
Qengè gotin ser te ye
Tirba xwe ve dilivin

Ezmanê te bi stêr e
Rojhelat î rojava
Rojeq serxwe bibî tu
Bi zanîn be, bi dehwa.

# Zanîn

Zanîn e brayê min ê delal
Ruhnîya xort û ruhnîya qal

Serî re çav; ji hiş re zanîn
Binyanê dinê; bi wê re danîn

Zanîn her tişt e nav, deng, al, bext
Mezinahî ye şeref û text

Zanîn xurtî ye zexmîya dil
Nezan qetî ne xulam û dîl

Jîr û hiş zanîn roj, stêr û tav
Jîn çol e zanîn mèrg, rèl û av

Nezan guhnade qer lal û gèj
Jîna wî tarî vala kirêj

Bè zanîn ne deng, ne kedr ne al
Jin jinubî qur sèwî bê mal

Bè zanîn bajar gund qêl şewat
Tejî ax, hèstir tirb û gorn welat

Qitêb, kelem, şûr, bext û zanîn
Şeva tarî re roj tav anîn

Zanîn, zanîn tu bibe armanc
Ji bo min, ji bo qurd û qurmanc

# Bran

Du bira ne û geleq
Hej hev diqin ji berê
Mezin çi jî bibêje
Qiçiq dibêje herê

Her rûj diçin meqtebê
Bi dilxweşî biqenin
Her qes ji wan hez diqe
Her dibêjin aferîn

Cilên wan geleq paq e
Heq ji qevn e bi pine
Dizanin qo fekîr in
Dibêjin tu xem nîne

Perîşanî ne xem e
Dewlemendî zanîn e
Bi vê dinya geş qirin
Jê re ruhnî anîne

Bi zanînê qêrhatî
Hemî camêrên dinê
Xelq bajar û deştan de
Qortalê de em tinê

Dewlemendî zanîn e
Al û welat jî zanîn
Bi zanînê brayê min
Binyanê wan tê danîn

# Ne ma

Key qurd mirin ne ma nêr
Ne mizgeft ma û ne dêr
Mêr bêjin in jin bê mêr
Ne mizgeft ma û ne dêr

Mirin bo min xweştir e
Jiyîna min hêstir e
Ji çavên te reştir e
Jiyîna min hêstir e

Ava Ferat bi qeser
Ne pê maye û ne ser
Bûq mirin e'bûne zer
Ne pê maye û ne ser

Ava Dicle girîn e
Agrî weqe birîn e
Xencera xwe derîne
Agrî weqe birîn e

Evdirehman mir û qet
Çavê Botan mir û qet
Ruhna qurdan mir û qet
Çavê Botan mir û qet

Gozgeh, Şirnex şîn û reş
Ne çav ruhnî ne dil geş
Em heft bûne mane şeş
Ne çav ruhnî ne dil geş

idlîs li qû li qû Wan
Xarpût li qû û Botan
Gor tejî ne ji xortan
Xarpût li qû û Botan

Welatê jor û jêrîn
Tev girîn e tev birîn
Welatê Xanî û Zîn
Tev girîn e tev birîn

Ezmanê me bê stêr e
Lê roja me bi zêr e
Jartirê me jî şêr e
û roja me bi zêr e

Jiyîna min hêstir e
i çavên te reştir e
Mirin bo min xweştir e
Ji çavên te reştir e.

# Bavo

Xweş û honiq buhar e
Bi gulnexwîn bi dar e
Tev gulan û Adar e
Lê bavê min li qû ye.

Diqenin pal û çiya
Qesq bûne mêrg û giya
Dinê bi rewş dinê şa
Lê bavê min li qû ye

Gund diqene kesr ava
Ne şer maye ne dehwa
Rojhelat û rojava
Lê bavê min li qû ye

Mal û xanî bi mêvan
Qerî bi pez bi şivan
Tejî bûqiq bûn daran
Lê bavê min li qû ye

Fêqî çêbû ne xav e
Deşt ne mirî bi av e
Dinê geş e bi tav e
Lê bavê min li qû ye.

# Mirine

Pismamê min çû ne hat
Bavê min jî li wê ma
Nav qortal û zinaran
Nav qaş û befr û çiya

Bi mêranî mirine
Gî go iyên welat in
Ji gundê me bîst zelam
Hemî çûn û ne hatin

Bi hezaran mirine
Ji bo felata welat
Diĵezmanê dilî de
Xwîna wan e rohelat

Bûq û jin jî mirine
Cano tu jî vemire
Rûjeq dê bê, bê şiq e
Dijmin weq se bimire·

# Lo.. lo..

Lo qeqê min megirî
Dinê wisa namîne
Em jî rujqê dê rabin
Paşîya me qenîn e
Bi ronahî em zexm in
Bi kelem û qitêban
Em dikutin hêsinî
Bi zanîn û meqteban
Lo qeqê min megirî
Deh milyon in dinê de
Hej welatê xwe biqe
Di mirin û jînê de
Ronahî ye ruhnî ye
Geş bû ye tu geştir be
Bixebite bimeşe
Şev reş e tu reştir be
Metirse ji badevan
Hêsanî ye hêdî ye
Dilê tirsoq sîngên gewr
Tucar ne girt ne dîye.
Lo qeqê min megirî ;
Deh milyon in dinêde !
Hej welatê xwe biqe .
Di mirin û jînê de.
Binivîse ! ! bixwîne ! !
Xebat, xebat felat e .
Lo qeqê min megirî ;
Dayiqa te welat e ! !

# Siltan Selahedîn

Şah e ; mezin e ; bi nav û deng e
Dîroqa dinê bi wî ; bi reng e.
Siltan, mezin û qurd e ew mîr
Navê wî ne mir û ket ne bû pîr
Şah e mezin e çira li dinya
Zanîn û hiner bi şûr û dehwa
Rewş û qerem e, delalê qurdan
Rewşa du dinê delalê dewran
Dewsa qeremê ji nû ve şaqir
Tava hinerê vejand û raqir
Bê dad ne bû û dil ne êşand
Ew şûr û kelem bi hev re gêrand
Rawende ye ew ji êla rawend
Edla wî ne hişt cefa û merbend
Misr û Ereb û cihana Efrenc
Tesxîr diqir bi edl û bêrenc
Destê wî tejî bi edl û ruhnî
Ma jê re qerem bû genc û qehnî
Dermanê elem birîn û jarî
Destê wî tejî bi arîqarî
Destê wî tejî hedîs û kurhan
Zanîn û hiner û ruhna firkan
Qulma wî tejî ji jîn û derman
Tirba wî ye rih û canê qurdan

# Gata Qoreqî

Dibihîsim qo dinê
Geleq xweş û spehî ye
Welat bi gund û bajar
Aşîtî avahî ye.

Dibihîsim qo qulîlq
«Sor û spî ne qesq û zer»
Qabe cihqî bilind e
û gorina pêxember

Dibihîsim qo ezman
Tejî stêr û ruhnî ye
Dibihîsîm qo dinê
Tejî rêl û qehnî ye

Dibihîsim qo dinê
Ne weq cem min her reş e
Dibihîsim qo buhar
Bi bihn û reng û geş e

Dibihîsim qo ruhnî
Zanîn rewş e û ditin
Çikas tehl e tarîtî
Tinê jarî û qetin

Ji dil çikas dixwazim
Ez çavê xwe vejînim
Tinê carqê û demqê
Welatê xwe bibînim

# Canê min têse

Dinê tarî û reş e
Dil û sînga min êş e
Birîndar im bêbirîn
Dayê canê min têşe

Birîdar im dizanim
Birîn li qû nizanım
Ser çavê min birondiq
Frdê xwe de biyan im

Şev reş e û tarî ye
Dijmin û neyarî ye
Derman li qû, derd li qû
Jiyîn, girîn tarî ye.

Ava Xabûr ne sar e
Dilqetî bûn ne ar e
Rêbêrê me Şêx Seîd
Ne miriye li dar e

Enîya wan bixwîn in
Bi qurmancî dixwînin
Dest û sîngên wan tejî
Birîn û gulnexwîn in

Qemal, Fewzî çi mêr in
Gorina wan ji zêr in
Bi Extî diqtor Fiad
Li qurdan ew dinêrin

Qurdno, lawno dibêjin
Meh, sal bilind dirêj in
Êdî bes e xwîna xwe
Gî bo welêt birêjin

Welatê me bêqes e
Dijminê me ne qes e
Em in dijminên welêt
Êdi bêbextî bes e

Lawno werin hawarê
Fêqî bibin ji darê
Qurd ne mirin, ne mirin
Weq qulîlqên adarê



# Welat û dilê min

Ev çend sal in dilè min ket ne geş'e;
Dinê tarî, dinê êvar û reş e.

Dilê min ket, ne ava bû ne bû geş;
Buhara min, pehîza min, hemî reş.

Di çolê de, di deştè de tinê me;
Key rondiq im; key ez şîna dinê me.

Xweş buhar e, lè xerîbî jarî ye
Min çi qir qo dinè li min tarî ye

Min çi qir qo zaroyèn min mirine;
û ronahî ji çavèn min birine.

Bê xanî me; bè tifiq im; bè welat;
Her ji min re maya bèbext rohelat.

Min bûq ne dît, zaro ne dît ne dît al
Porên min gewr, ez pîr bûme, bûme qal

Welatè min biqen, tiştqî bibèje
Lalbûna te çima hevkas dirèj e.

Çima hevkas; tu bèdeng î û bê nav;
Bila bibin; gorîyèn te sih û tav.

Welatê min biqen biqen megirî ! !
Ji bîra te hêj derneqet Agirî ? ?

Qemal Fewzî, Extî, Fiad ne mirin;
Ji nû ve ew; rêya te de dimirin.

Ji nû ve ew, ji tirbên xwe radibin,
Ji nû ve ew, dimirin pê şa dibin.

Sînga te de veşartî ne çend hezar
Çend hezar jî bê gond mane bê bajar

Çend hezar jî sêwî mane û bê mal
Text jî çû ye, bext jî çû ye ne mal

Lê bawerî sist ne bûye nabe jar
Qelên te ne tev gundê me tev bajar

Qelên te ne sîngên qurd û qurdmancan
Mirin nîne bo giyanê armancan

Bawerî ket mirin çi ye nizane
Jiyîna wê bêmirin e dizane

Ava bibî, serxwe bibî megirî ! !
Ji bîra te hê derneqet Agirî.

| | |
|---|---|
| Dibistan | 3 |
| Heyv û Stêr | 4 |
| Şêx Seîd | 5 |
| Derman | 6 |
| Dilê Çûqê | 7 |
| Ya dê | 8 |
| Xweha min | 9 |
| Qitêba min | 10 |
| Dilalê | 11 |
| Gornistan | 12 |
| Derew | 13 |
| Dengê dê | 14 |
| Nûbuhar | 15 |
| Qeytxweşî | 16 |
| Yeqbûn | 17 |
| Tevda | 19 |
| Defter | 20 |
| Sêwî | 21 |
| Dilê min | 22 |
| Du bira | 23 |
| Xebat | 24 |
| Ala Qurdan | 25 |
| welatê delal | 26 |
| Zanîn | 27 |
| Bran | 28 |
| Ne ma | 29 |
| Bavo | 31 |
| Mirine | 32 |
| Lo.. lo.. | 33 |
| Siltan Selahedîn | 34 |
| Gata Qoreqî | 35 |
| Canê min têşe | 36 |
| Welat û dilê min | 38 |